

# Azadîa rastî çi ye?

Me axiftinekê Inglîzîê heye: “Ewê bi şîrî dijît, bi şîrî dê mirit.” U ew jî rast e:

## Ewê bi desturê dijît dê bi desturê ête dad kirin.

Ĥemîa wijdanekê hey. Wijdan Xwidê yê dilêt me da nivîsî. Me jî desturê Xwidê jî destê Musa pêxember li ser kitêba nivîsîn yê hey.

Da asayîş li welatêt me yê azadî hebit, dadwer destura dirist dîkin da hev welat bizanin ku çi dirist e u çi ne dirist e. Behira pitir jî desturê welatêt me baş in. Belê jî ber miruv divêt leşê xu razî bikin, ew jî desturê xirab çêdikin yan dihêlin.

Bu nimûne li Emrîke Ĥelal e heker jinek biçîk jî ber xu bibit. Belê bi destura Xwidê ew kuştin e. Li ‘Îraq – jî ber berpirsîarî ya desturê kême – hindek miruv hizara hizar dular (yê hatin dan bu pêşkeftina ‘Îraqê) bu xu hildigirin u nadine hejara bi dirist. Bi destura Xwidê jî ew dizî ye.

Ew kesê li dîv desturê Xwidê ne çin gunnehkar in. Ew miruve divêt biêne dîar kirin ku li ser desturê çin u nav dilê xu da ne wesan in, u eve dûrîatî ye. Bi çavêt Xwidê, her dû gunnehkar in u dû rî xirab in. Ez nimûnekê dê dime we piçekê qehire, belê li ser babetê min e.

Li komela Kurdî ‘edetekê hey dibêjit jinek pêtivî ye kiç bit roja şîkirnê. Ew ‘edete baş e u berê xu desturê Xwidê da ku pêtivî ye miruv xu jî dehmenpîsî dîr bêxit. Bu nimûne kiçek hebî u bu roja şîkirnê ew ne kiç bî (çunku kesekê dest drêjî li ser namîsa wê kir bî), u jî ber ‘edetê mala wan babê wê kuşt. Belê jî ber babê wê jî ne kesekî dirist bî li gel jîna xu, ew dû rî ye. Pêkhatî li gel desturê Xwidê ew gunnehkar e u pêtivî ye ew jî biête kuştin.

Belkî tu dibêjî, “Ma çi ye? Kî dê zanit heker zelum

ne paqij e?” Heker ew desturê we ye, ew jî bi destê miruvê ye u ne bi destê Xwidê ye, çunku Xwidê Ĥemî miruv jî desturê êk dad dîkit. Bi çavê Xwidê, miruv miruv in, yan nêr yan mê, u pêtivî ye Ĥemî miruv jî dehmenpîsa dîr bit.

Evê bizane: heker tu u komela we bi desturê dijîn, hîn dê jî vê desturê dê êne dad kirin.

## Ewê li jêr çakîa Xwidê dijît dê bi çakîê Xwidê ête dad kirin.

Ĥemî tişt yê Ĥelal e, belê Ĥemî tişt ne yê bi mifabî ye. Ĥemî tişt yê Ĥelal e, belê Ĥemî tişt ava naket.

Xwidê bi dadperwer e u bi diluvani ye u jî bi çakî ye. Li dumahîkê jîanê, her miruv dê ête dadkirna Xwidê bu dû tişt: (1) yan bawerîa wî bi Xwidê pêkhatî li gel ser rêka Xwidê bîkî u (2) jîana wî li ser ‘erdê çawa ye.

U nuke bila nimûna li pêşîê sehîkînê u kiçê u babê wê bi çakîê dad bikîn pêş desturê ve.

Li kiçê bila bibure u biparêze. Ji ber dest drêjî li ser namîsa wê hat bî kirin – ne bi destê wê bî – ew ne kiçek bî roja şîkirna xu. Zavaê wê bila Ĥejê bîkî u qebîl kit. Babê wê bi taybetî bila Ĥejê bîkî u qebîl kit çunku ew kiça wî ye u çunku ew (u te’idaî) bî xu her dû gunnehbar in u dehmenpîs in. Bila ew dû zelum pêtivî ye jî gunnehê xu bizivirine ve u bila pêtivî ye nîşa kiç u kurrêt xu bikin çawa her dem bimînî paqij. U bila em jî li babê u te’idaî ker biburîn u qebîl bikîn çunku em jî gunneh dikîn.

Me divêtin bi azadîê bijîn. Bila azadîê neke armanc da leşê xu razî bike, belê pêşve bibîne xulam di xizmeta êk u dû da bîn. Hindî desture Ĥemî diête lêkdan di êk şîretê da: “Tu çawa Ĥeş jî xu dikî wesa Ĥeş jî nêzîkê xu jî bike.”